Di bîranîna roja rojnamevaniya kurdî de Seyranek li gundê Elî Bedranê

Di bîranîna roja rojnamevaniya kurdî de û bi helkeftina derketina yekemîn rojnama kurdî ye, bi navê (KURDİSTAN) Ji aliyê bavê rojnama kurdî (MİQDAD MİDHET BEDİRXAN) li QAHîRÊ di 1898 an de , di 21ê NÎSANÊ de Li gundê (ELÎ BEDRANÊ) herêma Aliya , bi kenê gul û nêrgizan re ,koma (MÎDYA) ya folklora kurdî û bi beşdariya van komên folklorî (MÎTAN- HELEBÇE- AMÛDE- RONAHÎ- HÊVÎ- YEKÎTÎ- RONAHİYA ALİYAN). Cemawerê kurd ji gund û bajarên xwe, bi sira bayê rojava re li baskê ewrên sipî - wek dilê qîz û xortên kurda – siwarbûn û berê xwe dane gundê (ŞAHA REMO),her lat û gulek bi zimanê çûk û bilbila digot: Hun bi xêr, serseran û heru çavan hatin!!!

Bi dehan mêvanê fistîfalê berê xwe dane bin konê mêvanan û dihatin pêşwazîkirin, ji wan :

1-Mumtaz Elhesen (avokat)
2-Hewas Mehmûd (nivîskar)
3-Nidal Derwîş (endamê komîta mafên mirovan li SÛRYA)
4-Ebdilhekîm Umer (dîrokvan)
5-Bavê Derbas (welatperwer)
6-Malbata Ilyasê Remo bavê Heval
7-Şêx Murşid Elxiznewî
8-Azad Ehmed Elî (nivîskar)
9-Ebdilılah Başa (nivîskar)
10-Nisrîn (çîroknivîs)
11- Ednan Ebû Hêco (hunermend)
12-Ednan Beşîr (nivîskar)
13-Mihemed Qasim (berpirsê girûpa Dêrikê ya çanda kurdî)
14-Bessam Elte,ean (çîrok nivîs)
15- Xalid Cemîl (rexnevan)
16- Ehmed İsmayil(nivîskar)
17-Evîn Şikakî (helbestvan)
18-Mesûd Eko (rojnamevan)
19-Ehmed Eko (nivîskar)
20-Rêwî (helbestvan)
21-Hêminê mîdî (helbestvan)
22-İbrahîm Elyûsif (nivîskar uendamê komîta mafê mirovê kurd li Sûryê)
23-Mihemed Ebdo Ebdo (helbestvan gurûpa Dêrikê) Û jimarek ji kesayetiyên civakî li devera Aliya û Dêrikê beşdarî festîvalê bûn.

Hin birûsk hatibûn rêkirin ji aliyê:

1-bavê Sabir (endamê komîta siyasî ya partiya yekîtiya dîmoqrat)
2-Şêrgo Ebbas (serokê kongirê kurdî li WAŞİNTONÊ).
3- Hevgirtina rewşenbîrên kurd li derve.
4-Komîta mafên mirovên kurd li Sûryê
5-Gurûpa çanda kurdî li Dêrika Hemko.

Nûnerê weşana (NWEROZ) ev dîtin bi mêvanên fistîfalê re kirin :

Nidal Derwîş: *(Ez dibînim ku rojnama kurdî weke tê xwstin bi rola xwe ranebûye, ji ber hin sedeman, wek nepeydabûna azadiyên giştî, dîmokrasî û mafên mirovan. Ya dîtir bi rojnamevaniya kurdî ve girêdayî ye , Ku* **D.R(14)**